



Komên demaran ji bo pêkanîna emeliyatê li sermil, mil an destan

Ev belavok ji her kesê re ye ku difikire ku ji bo pêkanîna emeliyeteke li sermil, mil an destê xwe komeke demaran bistîne. Wê ev yek bi taybetî balkêş be ji yê ku nexwazin anestefîka gelemperî bistînin an jî ji wan ên ku hatiye şîretkirin ku ji ber mercên tenduristiyê yê bingehîn divê emeliyata wan di bin komeke demaran de were kirin.

Ev belavok ji hêla anesteziştan ve û bi alîkariya nexweşên ku di emeliyata wan de komeke demaran hebû hatiye nivîsandin.

Derbarê komên demaran

Brachial plexus block (Koma keziya baskî)

Koma keziya baskî koma demaran e ku di navbera stû û binçengê we de ye. Ew hemû rehên ku livîn û hestkirinê ji milê we re – ji milê xwe bigire heta ber tiliyên we – peyda dike.

Koma keziya baskî derzîkirineke ji anestefîka herêmî ya ku li dora stû, kirik an binçengê we tê kirin ku rê li pêş agahiyan (nîşaneyên êşê jî tê de) ku di nav van demaran re diçin 'bigire'. Pişfî derzîledanê, milê we pûç, giran û nelivînbar dibe û hûn ê bi vî awayî bi tu êş hest nekin, tevî ku gengaz e ku hûn ê hîn livîn û dehfandin an kişandinê hest bikin dema ku milê we ji bo we were livandin.

Koma keziya baskî ji bo tevizandina sermil û/ an mil hatiye çêkirin. Dibe ku ew di hin rewşan de li şûna anestefîkeke gelemperî were bikaranîn – ev bi taybetî ji bo nexweşên ku xwediyê rewşên bijîşkî ne ku ji anestefîka gelemperî dixin talûkeyeke mezin kêrhatî ye. Sûdeke din a emeliyata di bin komeke (blokeke) de ev e ku ew dikare xwe ji hin tevliheviyên gengaz ên ku bi anestetikên gelemperî pêk tînin, mîna hestkirina nexweşiyê an êşa gewriyê, dûr bixe (ji kerema xwe belavoka me bibîne Tu û Anestefîka Xwe ku li ser malpera me berdest e: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/leaflets-video-resources).

Heger hûn bixwazin, hûn dikarin werin hedarkirin gava hûn derziyên bloka keziya baskî bisfînin û/ an jî di dema emeliyatê de. Ev yek dibe ku we bike ku hûn sist an çavlixew hest bikin lê hûn ê bi tevahî bêhest nebin û dibe ku hûn hay ji derûdora xwe jî hebin.

Herwiha komeke ji keziya baskî dikare heta piştî 24 demjimêran ji emeliyatê hêsankirina-êşê peyda bike, tevî ku gengaz e ku di hin cih de êş werin kêmkirin an hestyariya di nav de heta 48 demjimêran were guhertin. Ew dikare bi anestetikeke gelemperî ve were girêdan. Ev tê vê wateyê ku pişt re sûda kêmkirina êş heye, lê hûn herwiha di dema emeliyatê de jî bêhiş in.

Anestezîsta/ê we dikare vebijarkên heyî û yên ji we re çêtirîn in vebêje. Ji kerema xwe bixin di bala xwe de ku ne hemû anestezîst wê bikaribin van koman (komên demaran ên taybet) pêk bînin.

Sûdên standina komeke ji keziya baskî

- Kêmkirina-êşê bi awayekî baştir (piştî emeliyatê)
- Kêm hewceyî ji bo êşbirên ên xurt – ev dikarin we nexweş bikin û dibe ku bibe sedema qevizê. Heger hûn wan di dema dirêj de bibin wan kêman caran talûkeya bengîtiyê bîne holê.
- Xwe-dûrxistina ji anestetîkeke gelemperî, tevî talûke û bandorên wê. Di nav bandorên giştî yên anestezîka gelemperî de nexweşî, êşa qewiriyê û çavlixewê ne.
- Karîn ji bo zû rabûn, gerîn û derketina ji nexweşxaneyê ve bi awayekî zûtir.

Komên demaran ên din

Heger emeliyata we li ser dest an mil e, dibe ku hûn bikaribin ku komeke demaran li ser rehikên binî mil be, nêzîkî dêst be bisfînin. Anestezîsta/ê we dikare vebijarkan bi we re gotûbêj bike.

RA-Keyaniya Yekbûyî (KY), civaka pispor ji bo anesteziya herêmî, ji bo nexweşên li ser komên demaran vîdyoyeke agahdariyê çêkiriye: Komên demaran: vîdyoyeke agahdariyê ji bo nexweşan: www.ra-uk.org/index.php/patient-info-video

Berî emeliyatê

Heger hûn emeliyeteke ji pêş ve amadekirî dikin dibe ku hûn çend hefte an çend roj berî wê ji klînikêk pêş-nirxandinê werin vexwendin. Carcarinan, ji bo emeliyateke piçûktir, wê hemşîreyeke/î bi we re têkiliyê li ser têlefônê saz bike ku bi we re hin pirs bipirse.

Ji kerema xwe bi xwe re van tiştên hanê bîne:

- pisoleyeke heyî an dermanên xwe di pakêta wan de
- heger hûn dermanan dibin ku xwîna xwe biav bikin, girîng e ku koma pêş-nirxandinê bizanibe û gotûbêj bike ka gelo hûn berî emeliyata xwe hewce ne ku dev ji van dermanan berdin an na
- çi agahî ku hûn li ba we li ser ceribandin û dermankirinê li nexweşxaneyên din hebin
- agahiyên li ser çi pirsgirêkên ku hûn an malbata we bi anesteziyê re li rastê hatine
- her pîvandinên xwînpestanê yên dawî.

Hûn dikarin li klînîkê bi bijîşka/ê anesteziyê re bicivin. An na hûn ê di roja emeliyata xwe de bi anesteziştê/ê xwe re li nexweşxaneyê bicivin.

Pirsên ku hûn dikarin bixwazin ji anesteziştê xwe bipirsin

- 1 Gelo wê kî derzî li min bide?
- 2 Gelo ez ê di dema emeliyatê de bi çi hest bikim?
- 3 Ma ji me re talûkeyên taybet hene ku ji vê cureyê anesteziyê hebe?
- 4 Ma talûkeyeke min ji anestetikeke gelemperî heye?
- 5 Gelo ji bo min bijareya çêtirîn çi ye?
- 6 Gelo wê çi bibe heger kom nexebite û ez bi êşê hest bikim? Ev yek çend car çêdibe?
- 7 Gelo Wê kengî milê min ji nû ve asayî be?
- 8 Gelo divê ez kîjan hejmar telefon bikim gava ez ji ber bandorên paşîn ên blokê xembar bikim?

Wê çavkaniyên me yê Saxlemtir Baştir Zûtir (Fitter Better Sooner) ji we re agahiyên girîng peyda bikin da ku hûn ji bo emeliyata xwe çêtir û baştir amade bibin. Ji bo agahiyên zêde, ji kerema xwe re malpera me bibîne:

www.rcoa.ac.uk/fitterbettersooner

Hûn dikarin belavokên zêde ku gelek agahiyên bikêr didin li ser malpera Kolejê bibînin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo. Herwiha dibe ku belavok di beşa anesteziyê an di klînîka pêş-nirxandinê yê nexweşxaniya we de berdest bin.

Di roja emeliyatê de

Divê nexweşxane şîretên zelal di derbarê xwarin û vexwarinê de bide we. Van şîretan girîng in. Heger di dema anestezişkirinê we de xwarin an şilav di zikê we de hebe, ew dikare ber bi qirik û pişikên we ve derkeve û jiyana we bike talûkeyê.

Standina derziyê

Wê bi piranî we bibin odeyeke li nêzê salona emeliyatê da ku hûn bloka demaran bistînin.

Ji bo bloka keziya baskî dibe ku derzîkirin an li kêleka stûyê we, di milê we de, an jî nêzîkê hestiyê qirika we were pêkanîn. Dibe ku demarên din li nêzê enîşk, an li bask, mil û destan werin girtin.

Dibe ku beriya derzîlêdanê dermanê hedarkirinê ji we re were pêşkêşkirin ku ji we re bibe alîkar ku hûn rehet û kêmtir xemgîn bibin. Heger hûn anestefiteke gelemperî jî bistînin, dibe ku ew berî an jî piştî derzîlêdanê were dayîn.

Wê çermê li dora de vera derzîkirinê were paqijkirin û wê derziyeke biçûk a anesteziya herêmî were bikaranîn da ku çermê we bitevizîne – Ew her ku diçe di nav şaneyan de hinekî gez dike. Wê anesteziyê amûra lereserdeng û/ an amûreke biçûk bikar bîne ku milê we bifirkîne da ku demaran bi cih bike.

Piraniya mirovan dibînin ku derzîkirin ji êşa derziyeke (kanûleke) di demarê de nayê êşandin. Ji kerema xwe re belavoka me Tu û Anestefîka Te bibîne Ji bo agahiyên zêde di derheqa derzî û anesteziya gelemperî. Ev li ser malpera me berdest e:

www.rcoa.ac.uk/patientinfo/leaflets-video-resources

Wê milê we dest pê bike ku germ be û bi rengekî sivik bizixtike be ku di dawiyê de giran û tevî be. Derzîkirin bi gelemperî di navbera 20 û 40 deqîqeyan de dixebite. Wê anestezîst hestên ku hûn dikarin li cihên cûda yê mil û sermilê xwe hest bikin kontrol bike. Wê we nebin odeya emeliyatê heta ku anestezîst razî be ku blok baş dixebite.

Heger blok bi tevahî naxebite, wê ji we re bêtir ji anestezîka ya herêmî, êşhêsankereke zêde yan jî anestezîkeke gelemperî were peydakirin.

Di dema emeliyatê de

Heger hûn nexwazin, wê dîmendereke bi awayekî bi cih bibe ku hûn nebînin ka çawa emeliyat tê kirin.

Di dema emeliyatê de dibe ku hûn ê bikaribin mûzîka xwe li ser cîhaza xwe bi berguhkar re guhdarî bikin – bipirse heger ev gengaz e.

Odeya emeliyatê cihekî qerebalix e – Wê li wir bi gelemperî di navbera pênc û heşt kes de hebin, her yek bi rola xwe ya alîkariyê ku li we binihêre û miqate be. Wê endameke/î ji koma anestezîkê ji destpêka emeliyatê ve heta dawiyê bi we re be û carinan jî dibe ku endamên din ên komê bi we re biaxifin û alîkariya lênihêrîna we bikin.

Herwiha dibe ku hûn bi Hevparên Anesteziyê re, , ku pisporên tenduristiyê yê pir perwerdekirî ne, bicivin. Hûn dikarin zêde li ser rola wan û koma anesteziyê li ser malpera me bixwînin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team

Heger hûn dermanê hedarkirinê bistînin, hûn ê sist bin û çavlixew bimînin. Dibe ku hûn oksîjenê bi rêya rûpoşeke sivik û plastîkî bistînin. Dibe ku bîranînên we yê li odeya emeliyatê hebin, tevî dibe ku ew bikêmasî bin jî.

Ji bo agahiyên zêde li ser hedarkirinê, ji kerema xwe re belavoka Hedarkirin Hatîye Ravekirin ku li ser malpera me berdest e binêrin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation

Heger hûn anestezîkeke gelemperî bistînin hûn ê tu tiştî derbarê emeliyatê neynin bîra xwe.

Piştî emeliyatê

Di dema ku blok tê xebitandin heta ku masûlkeyên we dîsa dest bi xebatê bikin. Dibe ku tu hewceya yekê/î bî ku alîkariya de wê milê we pir giran were hestkirin û wê pêdivî be ku bi werîsekê were piştgirîkirin te di pêkanîna karên rojane de bike.

Dema ku bloka demaran tê rakirin dibe ku tu di tiliyên xwe de bi tiştên wekî terziyan hest bikî. Ev yeka bi tevahî asayî û normal e.

Lênihêrîna piştî emeliyatê li malê

Divê tu milê xwe di werîsê de ku ji bo piştgirî û parastinê dane te bihêlî. Tê bi tevahî nizaniyê ku destê te li ku ye – ji ber vê yekê ew dibe ku wekî encameke birîndar bibe. Ev tevizandina dikare bi gelemperî heta 48 demjimêran bidome.

- Lênihêrîna taybet li dora çavkaniyên germê bike, wekî agir an radyator. Dema ku milê we tevizandî be tê bi tu germahiyê hest nekî û dibe ku tu xwe bişewitî.
- Xwe ji karanîna mekîneyek an amûrên navmalî dûr bixe. Dibe ku ji sedî sed birînbûn biqewime dema ku di milê we de tu hest tune be.
- Li gorî ku ji hêla nexweşxaneyê ve hatiye rêvekirin, berî ku blok were rakirin, dest bi birina dermanên êşbirinê xwe bikin. Ev yeka girîng e wek ku êş dikare ji nişkê ve dest pê bike.

Alîkariya zêde:

Divê tu bi hewceyî alîkariyê xizmetên tenduristiyê awarte bî heger:

- tu di nav bêhnçikîtiyê bê-sedem re derbas bibî
- tu êşeke giran bikişînin ku ji hêla dermanên we ve nayê kontrolkirin.

Heger blok du roj piştî emeliyatê bi tevahî nehatibe rakirin divê tu bi anesteziyê/xwe re têkiliyê (li ser hejmarê ku di kaxezên fermî de hatiye nivîsandin) deynî.

Bandorên-alî, aloziyan û talûkeyan

Di anesteziya nûjen de, pişgîrîkên cidî ne gelemperî ne, lê talûke û metirsiyan bi tevahî nayên rakirin. Derman, amûr û rahênanên nûjen di van salên dawî de anesteziyê kir xebateke pir ewledar.

Mirov di awayê şirovekirina peyv û hejmaran de ji hev diguherin. Ev pîvan ji bo alîkariyê tê peyda kirin.

Anesteziyê gelek baldar dibin da ku ji hemû talûkeyên ku di vê beşê de tên dayîn dûr bikevin. Wê anesteziyê/xwe we bikaribe agahiyên zêde di derheqê van talûkeyan de û tedbîrên ku ji wan dûr bikevin bide we. Herwiha tu dikarî agahiyên zêde ji rûpelên agahiyên nexweş ên li ser malpera Kolejê berdest in bibînin:

www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets

Talûkeyên komên demaran di mil de

- Derzîlêdan li kêleka stûyê:dengketî, girtûka çav a daleqandî, guherînên di dîtiniya we de û bi gengazî piçekî ji bêhtengî. Van bandorên alfî gişti ne û her ku blok radibe ew ji holê kê m dibin.
- Derzîlêdan li dora kirikê: talûkeyeke hindik heye:kêmtirî 1 ji 1.000 talûkeya zirarê ya bergirtina sîhê. Ev yek dikare bibe sedemê hilweşîna pişikê – ku jê re niyomotoraks (pneumothorax) tê gotin. Ba dikeve di navbera dîwarê sîng û sîhê re ku jê re dibêjin cîhê perdeyê rexekî. Dermankirin bi mezinbûna wî cihî ve girêdayî ye – Dibe ku ew qet nebe sedema nîşanan û tenê li ser fîrêjek X a singê were dîtin. Heger ew mezin be, û tu bêhteng bibî, dibe ku tu hewceyê şoxilandinê singê (boriyek plastîk) bî ku ew alîkariya birêvebirina wê bike. Tu dikarî ji anesteziyê xwe bixwazî ku vê yekê bi te re bi berfirehî gotûbêj bike.
- Hemû derên derzîlêdanê:gelemperî ye ku yek ji lûleyên xwînê were qûlîkirin – wê anesteziyê/ê we zextê li wî derî bike da ku xwînrijandinê rawestîne.
- Li vir bûyera kirina jiyane di bin talûkeyê de kê m e. Wê anesteziyê/ê we van yekser birêve bibe. Ew dikarin li ser van bûyerên pir kê m bêtir ji we re vebêjin.

Xirabbûna demaran

- Talûkeya zirara demarî ya demdirêj a ku ji hêla blokeke ji keziya baskî ve dibe sedema guhertin an windakirina hestiyarî an hêzê bi zahmetî pîvandî dijwar e. Lêkolîn nîşan didin ku ew di navbera 1 ji 700 û 1 ji 5000 blokan de diqewime – wateya wê tê ku ew ne-gelemperî an kê m e.
- Heger blokeke we li binê milê we hebe, dibe ku talûkeya zirara demaran û encamên wê kêmtir bibin.
- Pir bi gelemperî, nêzîkî 1 ji 10 nexweşan di destê xwe de pûçek dirêj an tevizîn an qurçînbûnê serpe tîn. Wê van nîşaneyan di nav şeş hefteyan de li sedî 95ê van nexweşan, û di nav salekê de li sedî 99ê nexweşan çareser bibin.
- Çi be cureya teknîka anesteziyê ku tê bikaranîn ferq nake ji ber ku piştî her emeliyê talûkeyeke heye ku zirarê bide demaran. Ev dibe ku ji ber emeliyatê, cihê ku tu tê de yî an karanîna tûrnîkê (bendek teng a li ser milê jorîn, ku di dema emeliyatê de rê pêşî li xwînrijandinê digire). Li dora qada emeliyatê an jî rewşa tenduristî ya berê heyî, wekî şekir, werimîn jî dibe ku zirarê bide demaran.

Ji bo agahiyên zêde li ser zirara demaran, ji kerema xwe re li belavoka me "Zirara Demaran a bi Bloka Demaran a Derî ve Têkildar e"ku li ser malpera me berdest e binêrin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/risk-leaflets

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahiya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bifîkînin

(www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji)

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tî çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tê tî venihartin, lê xetere heye ku hin agahiyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ka ji me re bêje hûn bi çi difikirin

Em li pêşniyaran jî bo baştirkirina vê belavokê pêşwazî dikin.

Heger tu şiroveyên we hebin, ji kerema xwe ve wan jî me re bi rêya emailê bişînin:

patientinformation@rcoa.ac.uk

Koleja Qiralî ya Anestezîstan

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Duyem, Sibat 2020

Wê ev belavok jî roja weşanê ve di nav sê salan de were nixandîn.

© 2020 Royal College of Anaesthetists

Ne qedexeyê ku ev belavok jî bo hilberîna materyalên agahiyên nexweşan were kopîkirin. Ji kerema xwe ve jî vê çavkaniyê resen bigirin. Heger hûn dixwazînin beşek jî vê belavokê di weşanxaneyêke din de bikarbînin, divê piştrastkirîneke lîcîh were dayîn û logo, marqeyê û wêneyê jî werin rakirin. Ji bo agahiyên zêde jî kerema xwe ve bi me re têkilî deynin.